# QERTELÊ JI BILINDAHIYÊ DITIRSIYA

Çîrok

Nivîskar: **Lars Kilinting**
Werger: **Xelîl Duhokî**

Li alîyekê din, dûrî mêrg û çiyan daristanek hebû
Di nav daristanê de, candarên biçûk û mezin dijiyan.
Hinan ji wan hêlînên xwe di bin erdî de û hinan li ser erdî û hinan jî li ser daran çêkiribûn.
Û li bilindahiyê, ji kopên daran jî bilindtir
qertelan baskên xwe yên mezin li hev dixistin.
Tevaya qertelan dixwazin li bilindahîyan bifirin.
Ji bilî...

...Oryan nediwêrîya. Ew ji bilindahiyê ditirsîya!
Carinan ew jî difirîya, lê ji erdî hindik bilind dibû.
Ku bilindtir bifirîya, serê wî gêj dibû û ji hişê xwe diçû.
Oryanî xewn didît ku bilind difire û digel
qertelên din di nav ewran de, şaperên xwe lêk dide.
Carekê ew firîya û li dora darên nizim zivirî,lê dîsan li ser qurmê dara xwe ya xweştivî danî, yan jî digerîya.
Rojekê Oryan rûniştibû û temaşayî du qertelan dikir
ku li bilindahiyê li ser daristanê difirîyan.
"Çawan ez jî carekê biwêrim bi vî rengî li bilindahiyê bifirim? "
Digel xwe dipeyivî.
"Lê, dibe ku yekî din hizreka biçûk hebe", dengek hatê.
"Çi? Ev kî bû?"Oryan li dora xwe zivirî.
"Ew ez bûm", wî dengî lê vegerand."Li vê derê li beramberî te."
"Tu yekê biçûk î ", Oryanî got. "Tu kî yî? "
"Ez Çirkune me."Dibe ez bikarim alîkarîya te bikim da ku li bilindahiyê û di nav ewran de bifirî.
"Tu? "Oryan pê kenîya. "Tu ji biçûktirîn perîkê min biçûktir î."
"Lê hema bibêje, em malbatek în."
"Çawa tu dikarî alîkarîya min bikî ku bifirim?"
"Belê", Çirkuneyê biçûk fîtikand. "Dema roj derkeve, bila em li ser girê nêzîkî daristanê hevdu bibînîn."
"Nexêr, nexêr!"Oryanî gotî. Ne wê derê, ew der gelek bilind e, paşî ez ê bixewirim."
"Mixabin"Çirkuneyî got. "Ku weha be ez nikarim alîkarîya te bikim ku li bilindahîyê û di nav ewran de bifirî."
"Lê, lê..."pirtepirtek ji Oryanî derket.
"Raweste! Neçe. Divê ez berê hizirbikim..."
Piştî bêhnekê hizra xwe kirî. Got:
"Belê, baş e dê hewil bidim ku bêm."
Roja paştir siharê zû, Oryan hêdî hêdî ber bi serê girî bi rê ket.
Her ku ew ber bi jorê ve diçû, bêtir gêj dibû.
Li dawiyê gehişte serê girî, lê xuhdayî, gêj û westiyayî.
Lê, Çirkune xuya nebû.
Ez hatime xapandin, Oryanî hizra xwe kir. Ez ê çawan careka din biçime xwarê cem daristana xwe ya kevin û xweştivî?
Ew bi dirêjiya rojê, li wê derê ma û gelek poşman bû ku pêşniyara. Çirkuneyî pesind kiriye.
Dema bû şev, wî hizra xwe kir ku wê çawa hemî jiyana xwe li ser vî girî bidomîne.
Paşî dengek hat:
"Bi rastî ez hinek dereng hatim! "
"Em dikarîn siharê zû dest pê bikîn, niha tarî bûye."
Çirkuneyî got.
"Baş e, ne xwe heta siharê, ez ê li vê derê çaverêyî te bikim." qertelî got.
"Nexêr", Çirkuneyî got. " Siharê em ê hevdu li ser wê dara şikestî bibînîn."
Oryan lerizî. Hêşta ji girî jî bilindtir! Dema wî hizir li ser kopê darî dikir, êdî gêj dibû.
"Nexêr", wê derê gelek bilind e."
"Mixabin", Çirkuneyî got." Ku weha be ez nikarim alîkarîya te bikim ku li bilindahîyê û di nav ewran de bifirî."
Oryanî hizir li tevaya Qertelan dikir, ku çawan wan dibîne dema li ser daristanê difirin.
"Baş e ku weha be, ez ê hewil bidim."
Siharê zû Oryanî dest pê kir ku biçe ser dara şikestî.
Piþtûpiþt...

...û pêþûpêþ...
... li dawiyê xwe gehande serî.
Lê Çirkune xuya nebû.
Dîsan hatime xapandin, Oryanî hizir kir.
Niha ez ê çawan ji ser vê darê û vî girî bême xwarê?
Li wê derê rûnişt û hizra xwe kir.
Tevaya wê rojê dilmayî û bêhinteng bû.
Dema bûye şev, dîsan dengek hatê:
"Bi rastî ez hinek dereng hatim! "
"Em dikarîn siharê zû dest pê bikîn, niha tarî bûye."
Çirkuneyî got.
"Baş e ne xwe heta siharê, ez ê li vê derê çaverêyî te bikim." qertelî got.
"Nexêr ", Çirkuneyî got. "Siharê em ê hevdu li ser dara kajê bibînîn."
"Dara kajê! Ez vê nikarim."Oryanê got."Ew gelek tirsîya.
Ya rast tendirustiya wî jî têkçû.
"Mixabin" Çirkuneyî got: " ku weha be ez nikarim alîkarîya te bikim ku li bilindahîyê û di nav ewran de bifirî.
"Belê, belê", Oryanî got.
"Baş e ku weha be, ez ê hewil bidim."
Roja din wî destpêkir û hilkiþiya ser darê.
Hiþê min diçe hiþê min diçe, ez ê bixewirim.
Wî hizir kir.Lê nexewirî.
Ew bêliv rûnişt û newêrîbû şaperekê jî bilivîne.
Dûre dengek hat:
Çend baş e ku tu li vira yî.
"Alîkariya min bike"Oryanî daxwaz kir.
"Çawa ez ê ji ser vê dara bi sihim bême xwarê?"
"Temaşe bike", Çirkuneyî got: "Li wê bilindahiyê qertelek difire.
Ew dizane çi ye rê ya hatine xwarê."
"Lê ez çawan dikarim bipirsim? "
Ew li bilindahiyê ye.
"Bifire bo bilindahiyê û bipirse, ez wesan hizir dikim ", Çirkuneyî got.
"Çewa? "Oryanî pirsî.
"Xwe bilind bike. "Çirkuneyî got.
"Xwe bilind bike û baskên xwe veke."
"Baş e ku weha be, ez ê hewil bidim."Oryanî goî.
"Hema...
.. Xwe biavêjî! "
"Bêtir bi aliyê çepê de", Çirkuneyî got.
Pîçekê ber bi jorê de! Baş e.
Îcar rast bo pêþ ve..."
Oryan pir ditirsîya.
Daristan! Erd! Wî hizir dikir. Bi tenê ew
qertel dikare alîkarîya min bike ku ez bême xwarê!
Wexta ku nêzîkî wî bû, xwe berhev kir û got:
"Himmm...gelo tu yê bikarî ji bo tiştekî alîkariya min bikî?"
Her di wê gavê de, wî xwe dît ku difire!
"Ji hindê bilindtir pêwîst nake tu bifirî."
Çirkuneyî got.
"Ez difirim", Oryanî pistepist dikir.
"Ha ew tiştê ku te diviya bipirsî çi bû? "
Qertelê din got:
Lê Oryanî guh lê nebû...
...ew her zû ji wê navê dûr ketibû. Oryan li ser kevnedaristana xwe ya xweştivî firîya. Di encamê de wî jî mîna hemî qertelên din, şiya
biçe bilindahiyê û di nav ewran de bifire.
Hest kir ku baskên wî bi hêz in û zikê wî jî pêl dide.
Wexta ku wî li bilindahiyê, devera di bin xwe de dît;
oh, hest bi xweşîyekê dikir ku çawa bayê havînê wî bilindtir û bilindtir dibe.

**Qqertel**

Yek ji balindeyên me yên herî mezin e. Eger tu herdu baskên wî bipîvî, hingê bi qasî du metreyan dibin! Û giranîya wî jî digehe şeş kîloyan. Mirov dikare bibêje ku ew balindeyekê dirinde ye û candarên din dixwe. Ev çende jî, ji

niklê wî yê xwar û pencên wî yên tûj xuya dike. Rast e ku qertel balindeyekî mezin û bi hêz e, lê ew nikare candarên ji kêroşk û balindeyan mezintir helgire. Carinan xwarina ku candarên dirinde li pey xwe dihêlin, dixwe.
Qertel hêlîna xwe li ser kopên kevinedarên kajan ava dike. Ew ji tak û çeqên dara dirust dike, hêlîna wî mezin e û digehe çend sed kêloyan. Ya mê du hêkan dike û bi dirêjiya 45 rojan çavdêrîyê li wan dike, ta ku derdikevin. Di detspêkê de, têşkên wan nikarin tiştekî bikin, ew berdewam birsîne û divê dayik û bab xwarinê bikine di devên wan de. Ev çende du meh û nîva dom dike, piştî hingê ew dikarin xwe xwedî bikin.
Qertelên xort bi rengê şuklateka qehweyî ne û xalên sipî li ser baskan hene û dûv jî, sipî ku bi bergekê reş xemlandî ye. Hindî mezintir dibin, bêtir rengên sipî winda dibin û dema dibine şeş salî, îca bi tevayê qehweyî dibin. Li Swêdê piranîya qertelan di nav çiya û daristanên bakur de hene. Yên pîr bi dirêjiya salê li wê derê dimînin, lê yên xort di payîzan de, ber bi başûr ve diçin. Wê derê gerimtir e û di zivistanan de, bi hêsanî xwarin peyda dibe.

**Çirkune**
Di welatê me de balindeyê herî biçûk e. Giraniya wî ji şeş girama bêtir nîne. Di welatê me de, Çirkune teyrekê asayî ye. Ew bêtir li ser kopên daran dimîne û mirov nikare bi hêsanî bibîne. Ew hez ji wan daristanan dike ku bêtir darên kajan lê hebin. Çirkune, mêş, pêşî û kurman dixwe ku ji nav tîvilên daran û tak û çeqan de digire. Ew hêlîna xwe di bin çeqê darekê de çê dike ku mîna gokekî girovir e û serê wê jî vekirîye. Ya mê nêzîkî deh hêkan dike û du hefteyan jî, li ser kurk dike. Dema ji hêka derdikevin, dayik û bab alîkarîya wan dikin û xawrinê didine wan. Piştî du hefteyan, têşik dikarin xwe xwedî bikin û hêlînan bi cê bihêlin.
Piraniya Çirkuneyan di payîzan de, ber bi başûr ve diguhêzin, lê pişkeka wan di zivistanan de li vê derê dimînin. Dûre digel çîçika bi hev re difirin û di nav daristanan de li xwarinê digerin. Divê ew pir bixwin ji bo ku di zivistanan de xwe gerim biparêzin. Eger zivistanek gelek sar be, hingê piraniya wan ji serma dimirin. Lê çi tirs ji neman û vebirandina wan nîne, çinku yên ku di zivistanê de, çûyîne welatên gerim, di biharê de, dîsan vedigerin.

********************************